

**Vî Welatê Nas Bike**



# **Kurîya Başûr**

**Rûber : 99.274 kim 2**

**Hejmara xelkî: 48.324 000 milyon kes**

**Paytext : Sêol ( jimara xelkê wê nêzikî (17) milionan e)**

**Ayîn : şîmanî, bozî, kunfoşiyosî, kirstîan.**

**Ziman : Kurî**


**Pare : Wun**

**Sîstema Deshelatdariyê : Kom-areka dîmokrat**

**Giringtirîn Bajêr : Posan(3) milyon, tay ço (2,2) milyon.**



Kurîya Başûr dikevît e Rojhelata Asîa. Kurîya Bakûr li bakûrê wê ye. Deryaya yabanê li rojhelata wê ye û deryaya zer li rojavaya wê ye û tengava Kurîya li başûra wê ye. Kurîya bi her du beşên xwe ve "bakûr û başûr" di bin deshelata yabanê ve bû heta cenga cîhanî ya duwê. Li sala 1945 ê piştî yaban di şerî da şikestî Kurîya parçe bû û bakûrê wê kete di bin deshelata kumunîzmê ve û başûrê wê kete di bin deshelata emrîkî ve. Li sala 1950 ê, şerekê mezin di navbera her du parçeyên Kurîya da derket. çî nê piştevanîya Kurîya bakûr dikir, neteweyên êkgirtî jî piştevanîya Kurîya başûr kir û li sala 1953 ê şer rawestîya û Kurîya bi şêweyekê fermî parçe bû. Kurîya başûr zirgrave anku sê alîyên wê ave. Erdê wê deşt û kenarên deryayê ne û navenda wê çîyan e. Bilindtirîn çîyayê wê "2714" mêtiran yê bilnd e.





Keşubayekê navincî heye. Zivistanê sar dibît û hemî salê baran lê dibarin jiber hindê jî gelek daristan lê hene. Nêzîkî 21% ji erdê wê bi kêr çandinê dihêt û birinc, genim, ceh, pembu, tûtin, levena şekirê, silka şekirê, fêqî, keskatî û çalê dihêne çandin. Her wesa çêl û beraz lê dihêne bi xudan kirin û dar û masî jî dahatekê wê yê baş e. Ji samanên wê yên siroştî: giranêt, asin, zêr, risas, zink, rejû û menginezin. Kurîa Başûr beruvajî Kurîa bakûr welatekê dewlemend û arame û di warê pîşesazîyê da êk ji welatên here pêşkeftîyên başûrê rojhelata asîyane û welatê duwê ye li cîhanê bi avakirina keştîyan û pênceme bi çêkirina otumbêl û armwîşî. Piştî şerê azadîyê û ketina seddamê xwînrej, tîpeka leşkerê Kurîa başûr li hewlêrî xoch buyîne û gelek harîkarî pêşkêşî bajêr hewlêrê û Kurdistanê kirîne û berdewam kumbûna digel dam û dezgehên hikumeta herêma Kurdistanê diken û gelek şandên me ji bo rahênan û aşinayê çuyîne Kurîa başûr. Kurîa bi her du parçên xwe ve dîrokeka gelek xwînawî heye û gelek karesat bi serê xelkê wê hatîne û nuke jî rijêma diktatora Kurîa bakûr arêşeyeka mezin e hem bo gelê Kurîa û hem bo aşîya cîhanê jî.